The Kurdish Centre of
INTERNATIONAL P E N
A World Association of Writers
NAVENDA PEN A KURD
Kurdisches PEN – Zentrum e.V.

Dr. Zaradachet Hajo, President – Franziuseck 16, D - 28199 Bremen / Germany, Mobile: 00 49 (0) 1773351016
Moustafa Rechid, Vice President – Entenmühlstr. 2, D - 66424 Homburg / Germany, Mobile: 00 49 (0) 17627186964
Berivan Dosky, Secretary – 72 Diamond Road, Ruislip, HA4 0PG / UK, Mobile: 00 44 (0) 7968764617
Mehmet Sahin, Treasurer – Postfach 90 31 70, D - 51124 Köln / Germany, Mobile: 00 49 (0) 1719351171
Kakshar Oremar, Member – Gustav-Poensgen-Str. 37, D - 40215 Düssedorf / Germany, Mobile: 00 49 (0) 17620061534

Gelî birêzan

Ji bo vexwendina **Navenda PENa Kurd** bo vê konferansa dîrokî,

“15emîn salvegera dameziranding Mala Êzîdiyan ya bajarê Oldênbûrgê (Elmanya), konfêransa zanîstî ya bi mijara: „Şêx Fexrê Adîyan - hîmdarê dibistana felsefe û edeba Kurdî"

em silav û spasiyên xwe yî dilînî ji amadekar, xebatkar û beshdarên konferansê re pêşkêş dikin.

Rêxistina me, Navenda PENa Kurd, rêxistineke nivîskarî kurdistanî serbixwe ye, ya ku li ser qada navneteweyî ji bo parastin û bipêşvebirina ziman û wêjeya kurdî dixebite. Endamên wê nivîskar, wergêr, rojnamevan û weşangêrên kurd ji hemû deverên Kurdistanê û li derveyî welêt in. Endamên me yî ne kurd jî hene, ew li sernaserê cihanê heval û dilsozên ziman û wêjeya me ne.

Navenda PENa Kurd endama Navenda PENa Navneteweyî ye, ya ku 144 PENên neteweyên din heta niha endamên wê ne.

Navenda PENa Navneteweyî li cihanê bi gişti ji bo parastina peyva azad, ji bo aştiyê, ji bo mafên zimanan, ji bo mafên jinê, û ji bo berdana wan nivîskaran ji zîndanan, yên ku ji ber derbirîna ramanên xwe di zîndanan de girtî ne, dixebite.

Gelî birêzan,

çawa ku, bê goman emê di gotarên zanstî de, yên ku wê ji beşdarên konferansê werine pêşkêş kirin re, bibînin, Şêx Fexrê Adiyan yek ji zanyarên herî mezin yê wêjeya kurdî û fîlosofiya jiyanê ye.

Berhemên wî heta niha ji ber rewşa siyasî ya welatê me ne hati bûne nas kirin. Em bi hêvî ne, ku civîn û konferansên bê alî û zanistî, yên weke vê konferansê, wê me hê bi gelek berhemên nirxdar yên keç û kurên navdar î Kurdistanê serbilind bikin.

Em, weke Navenda PENa Kurd ji bo parastina ziman û wêjeya xwe bi vê rêya pîroz bawer in û em bipiştrastî dizanin, ku emê bi arîkariya hêzên şaristanî, weke xwediyên vê konferansa zanistî, xwe bigihênine armancên xwe.

Em careke din spasiyên xwe ji bo berpirsiyarên Mala Êzîdiyan li Oldenburgê dubare dikin, û pêşniyar dikin, ku ew bihêlin ev çalakî bibe ristekonfransên hersalî li ser efrandinên fîlosofê mezin, Şêx Fexrê Adiyan.

Û li dawiyê em ji birêveçûna konferansê re seketinê dixwazin, û silavên xweyî herî gerim ji hemû endamên Mala Êzîdiyan li Oldenburgê re pêşkêş dikin.

Spas û rêz ji bo guhdarkirinê

Bi navê Komîteya Birêvebira Gishtî
Dr. Zerdesht Haco
31.10.2008